Rexneya rewşenbîrî

Çalakiya me bi çavdêriya berêzî ye

Îsmayîl Tahir

Her dezgehek çi bi damezirandin û danan çi bi hilbijartin û dengdan bikevîte karî û desteyeka karî bo bihête dest nîşankirin, merem û bername û peyrew û program û armancek bo dihête berçavkirin da li ser biçît û karê xwe li ser birêvebibet û dbiyavê hizra bo hatî ye danan da bişêt xizmetên xwe pêşkêş biket û bernamê xwe li dûv şiyanan bekete û ketwar û kiriyar.

Li Kurdistanê û piştî 16 salên rebeqên azadî yê û karkirin û xebata bê rawesitiyan jibo sîstemkirina dezgehan û danana berê biniyatê dezgehkirina sîstemê karî nexasim yê rewşenbîrî û ragehandinê heta nuke çend alozî wasteng kefitîne dirê ya pêşkeftina roşinbîriya kurdî da jiwan ew xwe nizîkkirin û leglegiya hindek ji berpirs û nûnerên wan dezgehan bo berpirs û dewlemendên ne rewenşinbîr diken mîna xazokî û berzkirina kesayetiya wan ya vala bi rê ya dana şerefa çavdêrî yê bi wan kesan çi jiber wergirtina dirav û xercî yên çalakî yê bît yan jî xwe nizîkkirina wan berpirs û nwêneran digel layenên berpirs û dewlemend.

Bila em di rûn û aşkira bîn digel xwe û bêjîn ne tiştekê şirîn û ciwane xudan payekê leşkirî çavdêrî ya çalakiyeka edebî biket yan kesekê bazirgan çavdêrê êvareka helbest xwandinê bît, çend nivîser û rewşenbîr û edîbên navdar û xizmetkar dê li pişt wan kesanên ne rewşenbîr rûn û mamajeyan bidene çavkên kamîra û peyamnêran pûtekê baş bi berêzê bi den û dûr nîne çavpêkeftin û dîdar jî bihêne kirin û li ser rewşienbîrî ya kurdî bihêne hijmartin digel wê êkê ku û kesî dibineret da bawerî bi rewşenbîriyê nîne û her nizanît jibo çi û çewan ev cure çalakî ye dihêne kirin û mifa û giringî ya wan çend e û bi tinê armanc jê berizbûna kesayetî ya û ye didezgehên ragehandinê da û hîç delîveyekê jî jidestê xwe naken da bejin û bala wan didezgehên ragehandinê da berçav û xweya bibin.

Ev karê lawazê û dû r jibnema û prensîpên rewşenbîrî yê bi şêwekê gişti kartêkirineka lawaz û nerênî dikete ser derûn û kesayetiya hejêkerên roşinbîryê nexasim jitexa genc ku peyte bi kesanên roşinbîr û dana û mandîbûy dibiyavê rewşenbîrî nahête dan û berovajî giringî bi kesanên xudan pile û dewlemend û vala ji layê

hizirî ve dihête dan û dibîte egerê sist û xav bûna pênigavan ku texa nûgehiştî çav li roşinbîr û blîmetên şareza û hzirivan û diheman demda kêm dahat û deramet bi ken ku sube gera wan jî dê bi heman şêwaz hêt "gutine mirîşkê bo tu ditirsî gut min dayika xwe bi bistkê ve dît "jilayekê dîtir ve berê wan didete rê û çareyên ne rewa ku jicîhana rewşenbîrî û hzirê varê bibin û rê ya dewlemendkirin û wergirtina pileyan bigirin û pûtekê baş û ji hejî bi rewşenbîrî yê wek rêbaz nehêtedan.

Çend pênigaveka şirîn û dchê xwe dabûdemê sendîka rojnamevanên Kurdistanê tayê Duhok fîstivaleka rêzigirtinê bo nivîskar û roşnbîrê kurd û rojnamevanê dêrîn hafiz Qazî li Duhokê kirî û çend pênigavên pîroz bûn rêveberiya rewşenbîrî ya Duhokê bi dehan fîstivalên rêzlênanê bo bi dehan rewşenbîr û bilîmet û zimanzan û hunermendên kurdên zîndî û wexerikirî gêrayin, û çend hizireka hêjabû çavdêrî ya êk jivan fîstivalên here mezin û jihejî êxistî ye bin çavdêrî ya roşinbîrê kurd Ebdulkerîm findî.

Dibit dişiyanên jimareka berçava senter û bingehên rewşenbîrî da nebît diravê pêdivî bo gişt çalakiyên xwe didest da nebît û ew parê kêmê hikumeta herêmê wek pexşîn pêşkêş diket û rojane jî gefên kêmkirin û birrîna wê diket têra wan bizavan hemiyan neket lê divêt rêz û giringiyeka here baş û berçav bi çalakî yan bihête dan û ne bîte egerê hindê ku şerefa çavdêrî ya wan çalakî yan bo kesekê vala û kêm rewşenbîr biçît, demê pertûkek li ser mezaxtina diravî ya kesekê dewlemend dihête çapkirin li dûmahiya pertûkê bi supasiyekê mafê wî dihête parastin, ne ku xudanê pertûkê pêşekî yê dinivîsît, bi heman şêwe baş e di ahenga dest pêkirina çalakî yê da bi supasiyekê mafê wan layan bi hête parastin neku bi bine çavdêr û peyvan jî bi denê û tiştekê mezintir ji mafê xwe werbigirît.

Herdemê senter û bingeh û êketî û sendîkayên me yên karî ji bo xurtkirina bizava rewşenbîrî diken ev rêbazên çep û şkestî peyrewkirin û rê da van hizirên şaş û ne rewa dinav texa genc û law da beriz û mezin bi bin encam dê di diltezîn bin, dê ramanekê belav ken ku êdî kes çi tak yan kum rêbaza hizirê çulken û ji hizra pak varê bin û bi hemî şêwazan xwe gehînne rêza êkê ya wan dikêşîte nav navendan û di encamda bi xirabtirîn şêwe bi kevne ber behis û xeberan û hizra pak û rewşenbîrî û şarezayî ya baş peyrew naken, sîstem bereban dirust diket ka çewan dinavbera çav û biriyan da sîstemê jiyanê hemî ji layê yasa û peyrew û rewştan ve divan çend salên borî da li Kurdistanê hate gihorîn wesa sîstemê hizirê û roşnbîrî yîç jî li ber metirsyê ye bi xirabtirîn şêwe bi hîçte guhorîn û l cihê me şehsiwarên bilîmet û kûr û şareza hebûn dê encam berovajî hên û sûyarên şûr şkestî dê bi mişeyî ve dinav bizava rewşenbîrî da peydabin.

Bila nan bo nanpêjî bît û meydan jî sûyarên xwe hembêz biket û cihê ne ji hejî bo kesê ne ji hejî ne hête valakirin.